Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 411 nameronahi@gmail.com 12 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Baxçeyên zarokan barê jinan sivik dike












Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê du baxçeyên zarokan (Kulîlkên Pêşerojê û El-Berêm) di pêşxistina şarezahiyên zarokan de û ji bo sivikkrina barê hemû jinan bi taybet jinên kedkar roleke girîng lîst.

Di merheleya baxçe de zarok gelek şarezahî û tecrubeyên jiyanî bi dest dixin û ji bo merheleyên pêş jî bingeh e. Her wiha fersendeke ku jinên kedkar barê xwe sivik bikin û bi karê xwe re mijûl bibin.

Piştî rewşa şer ya li taxa Şêxmeqsûd tê û ji ber metirsiyên şêniyan ji dûrketina zarokên wan ji xwendinê, Kongreya Star ji bo vekirina 2 baxçeyên zarokan kar û xebat meşand. 7 mamosteyên baxçe li ser şêwazên danûstandina bi zarokan re, fêrkirin û alîkariya derûnî hatin perwerdekirin.

Baxçeyê Kulîlkên Pêşerojê beriya salekê li rojavayê taxa Şêxmeqsûd hate vekirin. Tê de 50 zarok hene.

Baxçeya El-Berêm beriya 3 mehan li taxa Eşrefiyê hate vekirin. Tê de 20 zarok hene.

Temenên zarokan li her du baxçeyan di navbera 4-8 saliyê de ne.

Zarok di baxçeyan de zimanên Erebî, Kurdî û Înglîzî dibînin û her wiha şarezahiyên tevgerê bi rêya lîstikan fêr dibin.

Endama rêveber a Kongreya Star Nehle Mistefe da zanîn ku li ser daxwaza şêniyan piştî serkeftina baxçeyê yekemîn kongreya baxçeyê duyemîn bi navê El-Beraêm li taxa El-Eşrefiyê vekir.

Her wiha Nehla destnîşan kir ku ev her du baxçe di birêxistinkirina jinan de roleke girîng lîst û barên jinan sivik kirin. Piştî ku zarok tev li baxçeyan bûn, jinên kedkar dem dît ku xwe ji qeydên civakê rizgar bikin û her wiha di karê xwe de xwe bi pêş bixin.


Şeza Tirad ji pêkhateya Ereb e. Ji zanîngeha perwerdeya baxçeyên zarokan derçûye. Li ser mijara baxçe wiha got: "Armanca baxçeyan tevî bidestxistina şarezahiyên ziman û bîrkarî, perwedekirina zarokan li ser rêgeza hevkariyê ye û her wiha pêşkêşkirina alîkariya derûnî ji zarokan re ye."

Her wiha Şeza Tirad destnîşan kir ku ew zarokan dişopînin û li gorî taybetiyên wan bi awayekî rast bi wan re danûstandinê dikin. Şeza diyar kir ku wan ji ber rewşa hin zarokan a taybet û ji bo çareserkirina pirsgirkên wan ew şandin aliyên têkildar...

***ANHA***

# Şaredariya Gel xebatên xizmetê didomîne





Şaredariya Gel a Reqayê ji bo geşkirin û vejandina bajêr xebatên xwe yên xizmetguzariyê bê navber didomîne.

Di 10'ê Adara 2018'an de Şaredariya Gel navenda xwe li bajarê Reqayê bi awayekî fermî vekir. Bi derfetên sivik xebatên sererastkirina gulistanên bajêr, sererastkirina kanalîzasyonê û xetên avê pêk anî. Ceyran gihande hin taxên bajêr û gelek pirên bajêr piştî ku DAIŞ'ê ew wêran kiribûn ji nû ve sererast kir û xist xizmeta şêniyan.

Şaredariya Gel a Reqayê ji hevserokan, 270 endam û 14 komîteyan pêk tê. Komîte ev in: Komîteya teknîkî, komîteya kanalîzasyonê, ragihandin, hawirdor, aborî, zimhêr, el-dabta, parastin, garaj, têkilî, dîwan û komîteya gilî û gazinan. Van komîteyan ji bo vejandina bajar gelek proje bi cih anîne.

KOMÎTEYA AVÊ

Ev komîte ji aliyê Buroya Tenfîzî ya şaredariyê ve ava bû, ji 11 endaman pêk tê, di nav de endezyar, teknîsyen, rêveber û hin pispor hene. Hemû xebatên peydakirina ava vexwarinê dimeşîne. Heta niha bi kêmderfetan be jî komîteyê ji sedî 75 av gihand bajêr.

KOMÎTEYA HAWÎRDORÊ

Komîteyê heta niha 4 parkên sereke yên bajêr sererast kirin, parkên El-Reşîd, El-Bustan, El-Beyda û El-Melahî bi temamî hatine amadekirin û ji mayinên ku çeteyên DAIŞ'ê çandibûn, hatin paqijkirin. Her wiha komîteyê rogarên li ser rêyên bajêr paqij kirin û gelek dar çandin.

Komîteya Kanalîzasyonê

Komîteyê piştî rizgarkirina bajêr dest bi xebatên sererastkirina xetên kanalîzasyonê kir ku ji ber kolandina çeteyan gelek zirar dîtibûn. Heta niha komîteyê 3 hezar metre borî dirêj kir û 232 daxwaznameyên çareserkirina xetan ên şêniyan bi cih anîne.

KOMÎTEYA ZAGONÎ

Komîteya Zagonî (qanûnî) ji komîteyên şaredariyê yên herî çalak e. Xanî, mal û milkên şêniyan belge dike û her wiha di meşandina xebatên şaredariyê de roleke girîng lîstiye.

KOMÎTEYA FIRINAN

DAIŞ beriya ku ji bajêr derkeve, gelek firinên bajêr şewitandibûn. Komîte ruxseta firinên di nav bajêr de da. Her wiha komîteyê ji bo firinan ard jî peyda kir û ji ber gilî û gazinên şêniyan ji ber buhabûna nirxê nan, komîteyê buhayê nan kêm kir.

KOMÎTEYA VEGUHESTINÊ

Komîteya Veguhastina Hundirîn gelek gav avêtin. Jê sererastkirina 5 piran (Pira El-Romaniye, El-Sewami, Reqa, Semra û El-Firosiye) û niha jî ji bo sererastkirina pirên El-Mensûr, Marûde kar dike. Her wiha nirxê veguhastinê li gorî rewşa welatiyan diyar kir.

Alavên ku li gel Şaredariya Reqayê hene

Şaredarî niha 12 treks, 12 qelab, 12 sehrîj av, 2 cîhazên GPRS, 4 erebeyên paqijiyê û 7 traktoran bi kar tîne. Şaredarî hemû alavan ji hêzên koalîsyona navneteweyî werdigire.

PROJEYÊN ŞAREDARIYÊ


Bi armanca peydakirina xebatên xizmetguzariyê şaredariyê gelek proje amade kirine.

Li ser vê mijarê hevserokê Şaredariya Gel a Reqayê Ehmed Ibrahîm tekez kir ku şaredarî gelek destkeftî piştî rizgarkrina DAIŞ'ê bi dest xistine. Şaredariyê bi kêmderfetan rewşa xizmetguzariya şêniyan bi pêş xist. Ibrahîm diyar kir ku ji sedî 60 ji bajêr bi temamî hatibû wêrankirin û ji bo wê xebatên pir mezin meşandin, ji bo vegera şêniyan şaredariyê gelek xebat û xizmetên bingehîn wekî paqijî û avê pêşkêş dike...

***ANHA***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 411 12 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Di neynika dîrokê de Nêçîrvan Barzanî



Mihemed ŞAHÎN *R-5*

# LI KERKÛKÊ KOMÊN ÇETE YÊN DEWLETA TIRK

## DEWLETA TIRK WAN PERWERDE DIKE

Dewleta Tirk ya dagirker bi rêya avakirina komên çeteyên nû hewl dide alozî û tevliheviya li nava Sûriye û Iraqê zêdetir bike. Wekîlê Parlamentoya Iraqê yê YNK'ê Şiwan Dawidî diyar kir dewleta Tirk li Kerkûkê komên çekdar ava dike û wan perwerde dike.

## SAL Û NÎVE HATINE AVAKIRIN

Şiwan Dawidî diyar kir ku koma çekdar ji aliyê Eniya Tirkmen ve hatiye avakirin. Hate gotin komên çekdar rasterast ji hêla dewleta Tirk ve têne perwerdekirin. Dawidî diyar kir ku ev salek û nîv e komên çekdar hatine avakirin û hewcehiyên wan ên maddî dewleta Tirk dide. ***R-2***



## Li MÎT'ê sê mehan êşkence lê hat kirin



Ziynet Saglam dema ku êrîşên dagirker ên ser Efrîn Cindirêsê de hat girtin, diyar kir ku li navenda MÎT'ê êşkence lê hatiye kirin. Saglam got, "10'ê Adara 2018'an li gundekî Cinderesê mala ku lê bûm hat bombekirin û di malê de bav û keç yên xwediyê malê mirin ez jî birîndar ketim destên komên çete."

Ziynet wiha dewam kir, "Ji Efrînê ez birim Ezazê. Dema ez birim di rê de tim êşkence li min dikirin. Li Ezazê ez xistim hucreyeke ku 5 jinên Efrînî yên bi awayekî dijwar hatine êşkencekirin jî lê bûn. Piştî mehek êşkenceyê ez birim Dîlokê, ji wir careke din birin Ezazê. Careke din birin Kilîsê û di dawiyê de şandin girtîgeha Tarsûsê. ***R-5***

## Dixwazim rizgarkirina Efrînê bibînim



Dayîka Eyşe ya 105 salî ku niha li gundê Um Hoş yê Şehbayê dimîne da zanîn ku daxwaza wî ya dawî rizgarkirina Efrînê bibîne û vegere Efrînê. Dayî Eyşeyê got, "polîtîkayên ku berê di dema Îngiliz, Fransî û Osmaniyan de li ser Kurdan dihatin kirin îro jî dîsa dewam dikin." ***R-3***

## Kongreya Star li Qamişlo civîna xwe lidarxist



Kongreya Star bi boneya nirxandina xebatên hilbijartinan yên li navçeyên herêma Cizîrê civînek lidarxist. Civîna ku li navenda Kongerya Star ya Qamişlo hat lidarxistin hemû nûnerên Kongreya Star yên herêma Cizîrê beşdar bûn. Di civînê de rewşa xebatên hilbijartinan û rewşa rêxistinî hat nîqaş kirin. ***R-2***

## Çeteyên dagirker malên sivîlan dişewitînin



Kiryarên hovane û zilma dagirkeran li Efrînê bê navber dewam dike. Çeteyên dewleta tirk a dagirker malên welatiyên gundê Sariya yê girêdayî navçeya Mabata û mal û kargehên li navçeyê dişewitînin. Hat ragihandin ku koma çete ya bi navê Tabûra El-Ehfad roja Sêşemê 4 malên welatiyên gund şewitandin. ***R-2***

## Li Sine di qezaya trafîkê de 27 kes mirin

Li bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê pêr bi şev saet 00:00 li herêma nêzî Termînala bajêr, ji ber qezaya trafîkê 27 kes mirin, 5 kes jî bi giranî birîndar bûn. Hate ragihandin, tankera ku li otobusê qelibî ji Başûrê Kurdistanê hatibû û bi 18 hezar lîtreyî sotemenî tê de bû. Şahidan gotin, rayedarên Îranê saetekê piştî qezayê hatin cihê bûyerê û ji aliyê gel ve hatin şermezarkirin. ***R-2***

## Derbasbûna rêjîmê li Tebqayê rast nîne


Derbarê gotegotên girêdayî avakirina devereke ewlehiyê ya rêjîma Sûriyê li Tebqayê û wergirtina bendava Firatê de Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê daxuyaniyek da û ew îdia derewand û got, "Tu peyman bi rêjîmê re derbarê bendavê yan mijareke din de pêk nehatine." ***R-4***

## Li başûrê Sûriyê şerekî giran diqewime



Li başûrê Sûriyê li bejahî şerekî dijwar diqewime, ji hewayê jî bombebarana Rûsyayê didome. Şer li cihekî herêma Derayê ku çeteyên DAÎŞ'ê lê ne, rû dide. Şer li cihekî bi 4 kîlometreyan dûrî sînorê Urdunê û bi 10 kîlometreyan li ser xeta sînor diqewime. ***R-5***

## AKP'ê xwest, DAÎŞ'ê pêk anî



Konfederasyona Penaberên Bindest ên Ewropayê, ji bo 33 ciwanên li Pirsûsê hatî kuştin daxuyaniyek weşand û got, "Ji bo ji banga Rojava re bibin bersiv, bi dengê xwe can bidin jiyana nû, derketin ser rê. Xwestin li Kobanê ya ku ji DAÎŞ'ê hatî rizgarkirin, pirtûkxane, parkên zarokan çêbikin, daran biçînin. AKP'ê zemîn amade kir, DAÎŞ'ê jî komkujî pêk anî." ***R-4***

## Çerxa qirêj ya Erdogan



Bi rejîma Erdogan re rêxistineke nû ya bazirganî ava bû. Pereyên qirêjî cihokên nû ji xwe re dîtin. Ev çerxa ku li dora Erdogan ava dibe patronên nû çêkir. Hemû ji pergala nû re hatin hazirkirin. Ji berevaniyê bigirin ta bi enerjiye, perwerdehî, tenduristî, tekstîl û heta bi medyayê, li hemû sektoran torên Erdogan bû serdest. ***R-4***

## Me li ber xwe da, em ê li ber xwe bidin

Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven di dadgehê de parastina xwe bi Kurdî kir û diyar kir ger hiqûq ji bo her kesî weke hev buya ew ê îro li vir nehatiba darizaandin. Leyla Guven wiha got, "Heta niha me çawa di vê rêyê de li ber xwe da, em ê ji niha û şûnde jî li ber xwe bidin." ***R-4***

# Dewleta Tirk komên çete ava kirine

*Dewleta Tirk ya dagirker bi rêya avakirina komên çete hewl dide serweriya xwe li nava xaka Sûriye û Iraqê bidomîne. Wekîlê Parlamentoya Iraqê yê YNK'ê Şiwan Dawidî diyar kir dewleta Tirk li Kerkûkê komên çekdar ava dike û wan perwerde dike.*



Wekîlê Parlamentoya Iraqê yê YNK'ê Şiwan Dawidî diyar kir dewleta Tirk li Kerkûkê komên çekdar ava dike û wan perwerde dike. Berê jî li Kerkûkê dema ku endamekî çete hatibû kuştin, alaya Tirk il ser derketibû.
Wekîlê Parlamentoya Iraqê, yê YNK'ê Şiwan Dawidî ji Rojnewsê re axivî û da zanîn koma çekdar ji aliyê Eniya Tirkmen ve hatiye avakirin. Hate gotin komên çekdar rasterast ji hêla dewleta Tirk ve têne perwerdekirin. Dawidî diyar kir ku ev salek û nîv e komên çekdar hatine avakirin û hewcehiyên wan ên maddî dewleta Tirk dide. Dawidî got, "Piştî ku me agahî bi rayedaran re par ve kir, Berdevkê Hikûmeta Iraqê diyar kir ku haya wan ji hêzeke wiha tine.''
Dawidî xwest ku Wezareta Navxweyî ya Iraqê û Wezareta Berevaniyê lêpirsîna vê bike û pêşî li hêzeke wiha bigire.
Dawidî got hêzeke wiha ku ne li gorî zagonên Iraqê hatiye avakirin, ji bo Kerkûkê xetere ye.
Dawidî diyar kir ku dixwazin bi vê koma çekdar hêzeke mîna Heşdî Şebî ava bikin.
Piştî 16'ê Cotmeha 2017'an Kerkûk hatî dagirkin li herêmê gelek komên çete derketin û gelekên ji van bi ser dewleta Tirk ve ne. Li Kerûkê di şerekî de li ser çeteyê ku hatî kuştin ala Tirk derketibû.

## Dagirkeran li Efrînê 10 kesên din revandin



Çeteyên artêşa Tirk a dagirker 10 welatî ji gundê Gobeka yê girêdayî navçeya Mabata yê kantona Efrînê revandin û bi hinceta venêrînê mal û milkên gel talan kirin.
Li gor nûçeya ANHA'yê çeteyên artêşa Tirk a dagirker ên bi navê Tabûra Lîwa El-Şemal û El-Cebha El-Şamiyê du roj beriya niha, careke din êrîşî gund kirin û 10 welatiyên gund bi hinceta ku çek li gel wan hene, revandin. Her wiha bi hinceta kontolkirinê jî mal û milkên welatiyan dizîn û telefonên şêniyên gund desteser kirin.
Navên welatiyên ku hatine revandin wiha ne: Mihemed Nûr Ibrahîm (55), Iyanet Hemo kurê Henan (55), Menan Iyanet Hemo (30), Hesen Hemo kurê Reşad (46), Mistefa Mihemed Silêman (43), Fadil Hesen Yasîn (31), Kenco Hesen kurê Muxtar (55), Mistefa Hesen kurê Şêxo (30), Abdîn Hesen kurê Muxtar (58) û Gulgul Hemo kurê Henen (51). Hate zanîn ku welatiyên hatine revandin rastî îşkenceyê hatine.
Beriya sê rojan jî 4 welatiyên ji heman gundî ji aliyê çeteyên artêşa Tirk ve hatibûn revandin.

## Çeteyên dagirker malên sivîlan dişewitînin



Çeteyên dewleta tirk a dagirker malên welatiyên gundê Sariya yê girêdayî navçeya Mabata û mal û kargehên li navçeya Mabata dişewitînin.
Çavkaniyekî ji gundê Sariya, ragihand ku koma çete ya bi navê Tabûra El-Ehfad roja Sêşemê 4 malên welatiyên gund şewitandin. Li gorî gotinên çeteyan beriya derbasbûna rêjîma Sûriyeyê nava Efrînê ew ê hemû malên Efrînê bişewîtinin.
Heman çavkanî da zanîn ku çeteyan ji aliyê rojhilatê gundê navborî ango ji depoya avê dest bi şewitandina malên welatiyan kirine. Kesên ku heta niha malên wan hatine şewitandin ev in: Menan Heskilek (muxtar), Henîf Zalo û birayê xwe yê bi navê Mihemed Zalo û welatiya bi navê Nebîla Musteşar. Piştî ku çeteyên dewleta tirk a dagirker xaniyan dişewitînin, wan xaniyan wek noqteyên parastinê bi kar tînin.Çavkaniyekî din ji navçeya Bedînyê ya girêdayî herêma Raco ragihand ku çeteyên bi navê Lîwa El-Muntesir Billah, Lîwayê Mihemed El-Fatih û Ehfad El-Resûl, kargeha betaniyan a El- Ehram a dikeve ser rêya Raco şewitand, navê xwediyê kargehê jî Hisên e û ji navçeya Bedînyê ye.

## HPG'ê li ser çalakî û êrîşan daxuyanî da



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiya gerîlayên YJA Starê ya li Colemêrgê û bomberdûmana balafirên şer a li Herêmên Parastinê yên Medyayê daxuyaniyek da.
Daxuyaniya ku li ser malpera HPG'ê hate weşandin, wiha ye: "Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me yên YJA Starê roja 10'ê Tîrmehê saet 9'an, li dijî qereqola Girê ya li navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyek pêk anîn. Lê hejmara leşkerên mirî û birîndar nehate zelalkirin.
Hêzên me di çarçoveya pêngava şoreşgerî de êvara heman rojê saet 18:30'î li artêşa TC a dagirker a li ser girê Lêlîkan ê li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê xistin. Di çalakiya sekvanî de leşkerekî dijmin hate kuştin.
Balafirên şer 10'ê Tîrmehê saet navbera 20:00-22:00 derdora gundên Girava, Kortek, Bolê, quntarên girê Hîva û herêmên Gundê Silê yên Qendîlê, Dola Konferansê û qada Werxelê yên herêma Avaşînê, qadên Çemço, Kunişka û Gundê Filleha yên herêma Zapê, Dola Kêstê ya herêma Metîna, qadên Şehîd Bêrîtan, geliyê Aşutê û Kelaşîn ên herêma Xakurkê bombe kirin.
9'ê Tîrmehê saet 19:30'î bombe li qadên Dola Nêrgê û Alantus ên herêma Zapê barandin."

## Kongreya Star li Qamişlo civîna xwe lidarxist



Kongreya Star civînek bi boneya nirxandina rewşa hilbijartinên navçe û bajarokan û danûstandina pêngava duyemîn a hilbijrtinên navçeyên herêma Cizîrê li dar xist.
Civîna Kongreya Star bi beşdarbûna berdevka Kongreya Star a Rojava Evîn Siwêd, hevseroka kantona Cizîrê Heyfa Erebo û rêveberên Kongreya Star ên hemû bajarên kantona Cizîrê hat lidarxistin.
Komîteya amadekar civîna xwe ya duyemîn li bajarê Qamişlo li dar xist û di cijvînê de nirxandina hilbijartinên navçeyan û karê wan, astengiyên li pêş wan û çarserkirina van pirsgirêkan yên dema pêş de hat nîqaş kirin.
Hilbijartinên Kongreya Ster ên ku 10 rojan dewam kirin, di 51 bajarokên herêma Cizîrê de hatin lidarxistin û di her bajarokekî de 7 rêveber hatin hilbijartin û niha jî kar ji bo Kongreya duyemîn û ya giştî wê were kirin.
Di civînê de rêveberan pirsgirêkên ku pê re rû bi rû bûne, anîn ziman û raporek li ser rewşa hilbijartinan hate xwestin û paşê jî dan û standin li ser rewşa rêxistinî hate kirin.

## Di qezaya trafîkê de 27 kes mirin



Li bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê ji ber qezaya trafîkê 27 kes mirin, 5 kes jî bi giranî birîndar bûn.
Li Sineyê pêr bi şev saet 00:00 li herêma nêzî Termînala bajêr, tankereke petrolê li otobuseke parkkirî ya li ser rêya Dr. Huseynî qelibî.
Di dema qezayê de tanker teqiya û agir pê ket. Ji ber qezaya giran 27 kes mirin, 5 kes jî bi giranî birîndar bûn.
Hate ragihandin, tankera ku li otobusê qelibî ji Başûrê Kurdistanê hatibû û bi 18 hezar lîtreyî sotemenî tê de bû.
Şahidan gotin, rayedarên Îranê saetekê piştî qezayê hatin cihê bûyerê û ji aliyê gel ve hatin şermezarkirin.



# Jin çanda kevnar ya Kurd diparêze

***Kurd xwedî çandeke qedîm û kevnar in. Jinên Kurd jî di parastin û berdewamkirina çanda resen ya Kurd de di dîrokê heta roja îro roleke pêşengiyê lîstine. Leyla Mîro ya ji gundê Kaniya Dirêj ya girêdayî Dêrikê jî vê rolê îro jî berdewam dike.***



Kurd xwedî çandek kevnar in. Jina bi navê Leyla Mîro jî hewl dide ku çanda xwe ya kevnar bide jiyîn, peyama xwedîderketina ji bo vê yekê dide û dibêje, divê mirov her dem çanda xwe ya kevnar biparêze.
Parêzkara çanda resen Leyla Mîro ku ji Gundê Kaniya Dirêj a Dêrikê ye û 30 salî ye, hem ajalan xwedî dike hem jî nanê sêlê lê dixe. Bi vê yekê Leyla hem debara xwe dike hem jî çanda xwe ya kevnar diparêze. Leyla ji 12 saliya xwe heta niha nanê sêlê lê dixe. Leylayê diyar kir ku jina Kurd nasnameya çanda resen diparêze.


### PARASTINA ÇANDÊ ERKA HER KESÎ YE

Leylayê destnîşan kir ku divê hemû kes li çanda xwe ya kevnar xwedî derkevin û wiha got: "Ez ji zarokatiyê de çanda xwe ya kevnar diparêzim. Divê mirov ji çanda xwe û dîroka xwe haydar bin. Ji bo em di nav rabirdû û siberoja xwe de pira serkeftinê ava bikin divê em çanda xwe bidin jiyîn û agahiya me ji dîroka me hebin. Parastina çandê divê erka hemû kesan be."

### ROLA JINAN GIRÎNG E

Leylayê destnîşan kir ku di warê parastina çanda kevnar de rol û mîsyona jinê girîng e û da zanîn ku divê herî zêde jin hewl bide ku mirov ji hebûn û nasnameya xwe dûr nekeve.
Leylayê di dawiya bal kişand ser berdewamiya çanda kevnar û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ji ber ku zarok berdewamiya çanda kevnar e divê em çanda xwe ya kevnar hînî zarokên xwe bikin ku tune nebe. Ziman û çanda ku zarok hîn nebe wê bi ber tunebûnê ve biçin. Loma divê em girîngiyê bidin hînbûna zarokan. Jin û zarok hevdu temam dikin. Jin hînî zarokan dikin zarok jî digihêjîne siberojê."…*JINNEWS*

## Erka Hunerê



Rotînda YETKÎNER

Bi berhemên hunerê mirov dikare civakê bi coş rake ser pêya, bi kelegirî bixe nava xizanê û dikare weke serxoşek bide lîstandin. Lê ger hunera tê hunandin bi erk, bi dilsozî û bi rêk û pêk hatibe afrandin, an na weke nerîna post-modern ji kîreye, ji bo çi, armanc çiye wê ne diyar be.
Mirov her çiqasi di siyaset û di zanistiyê de têgihiştibe jî, ger di mejûyê xwe de bi xwe re ne Zelal be, wê tim nakokiyên mezin bijî. Mînak, gelek kes hene bi axaftina xwe şoreşgerek mezin xwe rave dide, lê bi pêkanîn xwe ji vê rastiyê gelek dûrin. Ger ev mirovên ne Zelal di qada hunerê de, bi navê huner berhem çêker be, wey li halê wê civakê kû ew jêre hunermedî dike.
Mixabin û sed mixabin ev kesên bi vî rengî di qada hunera Kurdan de gelekin û tiştên ku ew dikin û pêktînin, bawerkin wê di nava pêncî salên bê de qirêjiya wan neyê paqijkirin. Bi stranê dizî, tevlîhev, gotin û armonî li dij hev hatî hunandin, guhên paqij tev qirêj kirin û ev guhên qirêj nema êdî muzîka resên jî dikaribe bibihîse.
Bi çend hevokên li du hev rêzkirî, her hevokê ji derekê hatî stendin û tiştên jiberkirî li pey hev nivîsandî re gotin "helbest" û şaîrên resen êdî ji xwe fedîkirin û dev ji şaîrtiyê berdan.
Û em van mînakan dikarin bi sedan li du hev rêzbikin, lê bi kurtayî, hunera ku îro bi navê hunera kurdî tê hûnandin ji sedî yek ancax dikare di rastiya hunerê de cîh bigre. Kî an kê ji vê rewşê re derî vekir, ev jî bi serê xwe şîroveyek berfireh dixwaze.
Ger hûn bêjin ev kes bîst sale, sîh sale bi minre dimeşe û ji tevahî kiryarên wî-wê ên ne li gor hunandina hunera resen re bêdeng bimînî, dawîde bi navê hunerê bi tenê arabeska heyî dimîne li holê û qirêjiya wê bandorê helbet li ser civakê wê bike. Ev kesana tên astek wisa ku, êdî dikarin li dijî te bibin kelem û tawîzên dubare, dubare ji te bixwazin.
Tevgera Azdiyê ji 1990 virde di qadeke wisade ye ku, pêwistiya her hunermendan bi wî heye, lê pêwistiya wî tuneye ku ew tawîzek piçûk be jî bide tu kesekê. Lê yên ku siyaseta rojane dimeşînin vê rastiye her carê ji bîr dikin an jî nizanin an jî ji bo hestên xwe yên takekesiyê berçavan nagirin û ji arabeska ku qirêjî dadixe nava hunerê re, dibêjin "fermo keremke". Min bi xwe dehan caran ji devên berpirsyaran, gire giran ev hevok bihistiye; "Ma heya ciwanên me arabeska tirkan guhdarî dikin, bila ji felan kes, bêvan kesên me guhdarî bikin". Ev tê çi manê gelo?
Ji serî heya binî niha her kes dibê çi; "Di qada hunerê de xitimandin heye, hunermendên me nikarin bibin bersiva tekoşîna heyî". Ma we li naverastê huner û hunermend hişt ku bibe bersiv?

## Peymangeh mamosteyan perwerde dike






Gulbîn BOZO

Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê ya Cegerxwîn di vê demsala havînê de perwerdeya mamosteyên dibistanên seretayî didomîne.
Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê ya Cegerxwîn ya li Qamişlo xebatên xwe yên perwerdehiyê berdewam dike. Di vê demsala havînê de ji bo dibistanên seretayî mamosteyan perwerde dike.
Mamosteyên Peymangehê diyar kirin ku niha di peymangehê de perwerdeya 445 mamosteyan dewam dike.
Mamosteya Zanyarî Nesrîn Heyder diyar kir ku li Peymangeha Zandistên Perwredehiyê ya Cegerxwîn di aliyê rêbaz de perwerde baş tê dayîn û wiha got, "Hewl tê dayîn ku îsal di peymangehê de asta mamosteyan bilind bibe. Piştî ku dibistan tên girtin em perwerdeya mamosteyan dest pê dikin. Di van perwerdeyan de ji bo ku pêşketin çê bibe gelek nîqaş tên kirin û biryar tên girtin. Her wiha di van perwerdeyan hêjmara mamosteyên jin zêdetir in."
Endama Rêveberiya Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê ya Cegerxwîn Fadya Ferec jî da zanîn ku perwerde li ser branşan tê dayîn û diyar kir ku perwerdê di 16'Hezîranê de dest pê kiriye û wê heta 20'ê Tebaxê berdewam bike. Fadya Ferec wiha got, "Ji refa yek heta refa şeş pirraniya mamosteyan ji Qamişlo yê ne. Hêjmara mamoseyan 445 e. Wane li ser du beşan tên dayîn, yek wêje û yek jî zanist. Rojane perwerde ji saet 8'ê sibê heta 12:30 yê nîvro tê dîtin. Hêjmara mamosteyên ku waneyan didin 25 in."

## Komîna Film a Rojava film pêşkêş dike

Bi armanca hêzadyîn û moraldayîn, her wiha pêşxistina çanda sînama li Rojava Komîna Filim a Rojava li Herêma Cizîrê di 10'ê Tîrmehê de dest bi pêşkêşkirina filman dike.
Komîna Filim a Rojava li baharên Herêma Cizîrê, di 10 Tîrmehê de dest bi pêşkêşkirina du filîmên nû bikin. Filima bi navê Darên bi tenê û Xeyal, Filmê Darên bi tenê 40 xuleke naveroka filim ser girêdan û çanda jiyana komîna behvre jiaynkirin wekî kurd, ereb û Sûriyan vedibêje, yadin jî şagirtê akademiya komîna filim, filmê bi navê xeyal wekî kurte filim çêkirire. Her wiha ev herdu filim ji berhemên endamên komîna filmi in û ev cara yekmîn ku ev herdu filim li rojava û teybat Dêrik têne weşandin, lê hêjayî gotinê ku li 20 dewletên Eurupa hatiye pêşkêşkirin.
Bernameya pêşkêşkirinê wihaye: 10'ê Tîrmehê li bajarê Dêrik navenda Dicle, 11 Koçerata, 16 li bajarê Qamişlo li Nevenda mIhemed Şêxo, 17 li Amûdê li Navenda Horî û 19'ê Tîrmehê jî li kantona Hesekê bêne pêşkêşkirin. *Ronahî/Qamişlo*

## Di binê dêrê de şopên dîrokî

Di navbera navçeyên Kerboran û Mîdyadê yên Mêrdînê de li gundê Der Qubbeyê di binê dêrê de şopên dîrokî hatin dîtin. Der Qubbe navekî Suryanî ye û ev gundekî Suryaniyan e. Ji ber polîtîkayên dewleta tirk a valakirina gundên Kurdistanê ev gund jî di sala 1995'an de hat valakirin. Piştî ku gundî bi darê zorê gundê xwe terk kirin, li gund hemû mal û dêra hezar û 500 salî wêran bûn.
Di van salên dawî de hinek gundî vegeriyan gundê xwe. Gundî li aliyekî malên xwe çêdikin û li aliyê din jî dêra dîrokî restore kirin. Piştî ku dêr hat restorekirin, gundî diçin dêrê û taetên xwe yên olî tînin cih. Piştî demekê ji ber nemê gundiyan xwest ku dêrê çêbikin. Gundiyan axa li hewşa dêrê avêtin û di bin axê de hinek şopên dîrokî hatin dîtin. Di bin axê de depoyên avê, kule û dîwar hatin dîtin…*MÊRDÎN*



# Li Şêrawa û Şehba 4 geraj vebûn

***Li Şehba û şêrawa xebatên civakî û xizmetê berdewam dikin. Şaredariya Gel li van herêman li gor derfetên di destê xwe de pirsgirêkên gel çareser dike. Şaredariya Gel çar gerajên navendî li Şehba û Şêrawa vekir. Di van gerajan de nêzî 8 servîs wê xizmetê bikin.***

**Idrîs HENAN**





Ji bo çareserkirina pirsgirêka çûn û hatinê, Şaredariya Gel çar garacên navendî li Şêrawa û Şehbayê ava kir. Di van garacan de zêdyî 75 serwîs û 100 mirovan dixebitin. Hevserokên veguhestinê li Şehbayê tekez dikin ku bi riya van garacan zêdeyî 40 gund, gundik û navçeyan digihêjin hev û pirsgirêka çûn û hatina gel heya derceyeke baş çareser bûye.

### PIRSGIRÊKA BINGEHÎN REJÎM E

Hevserokê Birêvebirina Veguhestinê li Şehbayê Îbrahîm Heftaro destnîşan kir ku pirsgirêka veguhestinê bi hatine gelê Efrînê re zêde bû. Ji ber vê şaredariyê demildest biryar da ku garacên pêwîst bên avakirin. Heftaro dibêje: Di serî de me hejmare deverên gel lê bi cih bûye tesbît kir. Piştre dirêjahiya riyan hate hesibandin. Li gorî wê jî buha hatin destnîşankirin. Li gorî Heftaro pirsgirêka bingehîn ku sedema êşê ye, kêmbûna mazotê ye. Heftaro sedeman jî dispêra kiryarên çewsîner ên rejîma Sûriyê. Derbarê garacên hatine avakirin de Heftaro ev agahî da: Li gundê Aqîbê, Erfad, Ehres û Fafîn garac hatine avakirin. Bi riya van garacan zêdeyî 40 gundên Şehba û Şerawa digihîjin hev. Di van garacan de zêdeyî 100 kesî dixebite. Derbarê kirêya serwîsan de Heftaro diyar kir ku; kirê guherîner e. Li gorî buhayê mazotê lîste derdikeve..

### MECLÎSA AJOKARAN TÊ AVAKIRIN

Ji aliyê xwe ve Yasir Şêxo hevserokê birêvebirina veguhestinê li Şehbayê ji bo gundên ku li dûrî riyên sereke ne got wê di demên pêş de pirsgirêka wan jî bête çareserkirin. Şêxo derbarê çilekiya hinek ajokaran ku pereyên zêde ji gel distînin de got: Em li gorî gilî û gazinên digihêjin ber destê me, bi awayekî civakî û exlaqî pirsgirêkan çareser dikin. ji bo çavdêriyê jî me sîstema zabîteya trafîkê xistiye dewrê. Wê ev sîstem di pêşerojê de hîna aktîvitir bibe. Herdu hevserokan girêdayî birêxistinkirina ajokaran û zeftkirina lîstika bi buhayan, dawiyê de eşkera kirin ku wê van rojan meclîseke taybet a ajokaran bê damezirandin. ajokar wê di meclîsê de pirsgirêkên xwe çareser bikin. gilî û gazinên gel wê di vê meclîsê de bên nîqaşkirin. Ango wê ajokar bi xwe xwe bi rê ve bibin.

### BILA XIST BÊN DESTNÎŞANKIRIN!

Ajokarê bi navê Ehmed Abdulah gazinan ji buhayê mazotê dike û dibêje: rejîma sûriyê pirî caran riya mazotê bi zanebûn li ser şehbayê digire. Dixwaze di navbera gel de pirsgirîkan derxîne. Dîsa kesên çewsîner ku weke bazirganên şer tevdigerin hene. Ew jî bi rejîmê re vê pirsgirêkê kûr dikin. Abdulah bang li rêveberiyê kir ku bi koordîneya bi rêveberiya benzînxaneyê re rojane miqdarek diyar ji mazotê ji ajokarên serwîsan re bête destnîşankirin.

### LAZIME ZABÎTE XWEDÎ INSYATÎF BE!

Ajokar Ehmed Kobanê jî got: rewşa riyan li şehbayê ne baş e. gelek çal û riyên neqîrkirî ku erebeyên me xira dikin hene. Em ji rêveberiyê dixwazin li gorî îmkanên heyî çareseriyekê bibînin. Kobanê ji bo ajokarên çewsîner ku buhayê zêde distînin bang li rêveberiya vaguhestinê kir di zûtirîn dem de zabîteya xwe aktîv bike û got: Bila zabîteya trafîkê bi insyatîf be ku di cih de pirsgirêkan çareser bike.

### AJOKARÊN KEDXWAR ZEFT BIKIN!

Ajokarê bi navê Bekir Hemo jî dibêje: ji bo birêxistinkirina karê ajokaran û hêsankirina çûyîn û hatina gel, vekirin garacan gavek serkeftî bû. Lê dîsa jî hinek ajokarên çewsîner hene ku bê berpirsyarî tevdigerin û keda hempîşeyên xwe dixwin. Hemo diyar dike; ta ku pirsgirêkên me kûr nebin lazime meclîsa ajokara zû bê avakirin.

## Di Turnuvayê de tîma El-Şerkirak bi ser ket



Tîma El-Şirkirak di Turnuvaya Futbolê ya Şehîd Omer Elûş de ku li stada Eyn Îsa hatibû destpêkirin, bi ser ket.Lîstika dawîn a futbolê di navbera tîma El-Hêşa û El-Şekirak de dest pê kir û di dawiya lîstikê de tîma El-Şekirak bi 2 golan bi ser ket.
Turnuvaya Futbolê ya Şehîd Omer Elûş ji aliyê Komîteya Ciwanan a navçeya Eyn Îsa ya kantona Girê Spî ve hate birêxistinkirin.Di 18`ê Hezîranê de jî li herêma Firatê 15 tîm beşdarî turnuvayê bûn û li ser çar koman hatin belavkirin. Navên tîman wiha ye: El-Hêşa, Leqleq, EL-Dirûbiyê, Hezîma, Hêzên Parastina Civakî, Şehîd Arîn, Rical El-Muxeyem, Şebab El-Muxeyem, Girik, Elwihdê, Elsedaqa, Asayişa Celebiyê, Ebû Xerezê, Ehmêr, Elşerkirak.Endamê Komîteya Ciwanan a navçeya Eyn Îsa Ebdullah Silêman diyar kir ku wê lîstikvanên jêhatî kom bikin da ku tîmeke taybet ji bo navçeya Eyn Îsa were avakirin û li ser asta herêmê beşdarî turnuvayan bibe…*ANHA*

## EW ROJ 14’ê Tîrmehê



**Farûk SAKIK**

Piştî derbeya 12ê Îlonê li Tirkiyeyê di girtîgehan de pêvajoyek nû destpê kir. Girtîgeh bibûn wek kampên mirinê.
Hetanî 14ê Tîrmehê ev wiha dewam kir. Temamên rêbazan hatin ceribandin. Lê ji bor çareseriyê hewldanek hebû. Çalakiyek çawa? rêbazek çawa? nîqaş hebûn.
EWROJ.....
Di 14ê Tirmehê de, li Amedê, li dadgehê doza Hîlwan û Sîwerêk bi ber encambûnê diçû. Xeyrî çû ser kûrsî û ew axaftina dîrokî kir: “ Mirov ji bo parastina rûmet û nirxên xwe jiyana xwe didin ber çavên xwe. Em ê sucên mezin ên li vir pêk tên, raxine ber çavên raya giştî. Ji bo mehkûmkirin û rakirina îxanet û teslimiyetê, Mazlum Dogan û Çaran gavên pêşeng in. Wê li vir raneweste, wê bimeşe. Li vê derê her cureyê îşkenceyê li ser me tê meşandin, tu wateya jiyanê nema. Ez niha eşkere dikim ku ji bo protestokirina van kiryarên hovane ji vê demê û şûnde dest bi bi çalakiya `Rojiya Mirinê`dikim”
Ev gotinên Mehmed Xeyrî Durmuş 14 Tirmeha salan 1982an, li Amedê di dadgehê bilind bûn. Piştî Xeyrî Durmuş, ji kadroyên pêşeng ên PKK ê, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz, Alî Çîçek, Mustefa Karasu, Fuat Çavgun, Alî Kiliç, Bedrettîn Kavak û Hamîd Kankiliç jî tevlî rojiya mirinê bûn. Berxêdêrên rojiya mirinê anîn li koguşa 35an bicîh kirin. Li vêderê îşkence berdewam dikir. Ji bo dawî li vê çalakiyê bînin zextên dijwar hebûn. Lê çalekvan bi israr bûn.Êdî roj bi roj rewşa çalakvana xeter dibû. Mûstefa Karasû bû şahidên rojên dawî: “ Çavên Kemal piştî rojên 40’î êdî nedidîtin. Qet ji me re jî negot. Berê jî di greva birçibûna ya Adara 82an de cih girtibû. Ji wê demê de digot ku ez kêm dibînim. Bijîşk wî muayne dike, li Kemal dinêre, Kemal li cihek din dinêre. Piştî wê, tê famkirin ku çavên wî nabînin”Kadroyên pêşeng ên PKKê, ji roja 45emîn û vir ve, rakirin nexweşxaneyê.Mustafa Karasû jî li nexweşxanê bû: “Dema ku em di hucreyan de bûn, li aliyê min ê çepê Xeyrî li aliyên din Fuad Kav hebûn. Min birin nexweşxaneyê. Min li ser ranzayek dirêj kirin. Min deng kir, Akîf li wê derê bû. Min jê pirsî çi heye çi tune, got qasekî berî te li wî cihî hevalê Xeyrî şehîd ket. Min pirsa rewşê kir, tu tiştek ji min re negot, Min saet jê pirsî, got çavê min nabînin. Roja ez çûm wê derê roja 59an bû û çavên wî jî êdî nedidîtin. Me birin odeyek teng, li wê derê zincîr û 2 ranze hebûn. Diyar bû ku ev der demek dirêj nehatiye bikaranîn. Nizanim cihê nexweşên hariyê bûn, cihên nexweşên şêt bû nizanim. Çavên Akîf nedidîtin. Av didanîn navbera me, nikaribû avê billind bike vexwe, min av bilind dikir, wî devê xwe vedikir min avê diniqutand devê wî. “
Roja 7ê Îlonê Kemal Pîr, 12ê Îlonê Xeyrî Durmuş, 15 Îlonê Akif Yilmaz, 17 Îlonê jî aliyê Alî Çiçek, jiyana xwe ji dest dan. Di rojên dawî de daxwazên wan hatin qebûlkirin. Wê demê Mustafa Karasû dijiya û hevdîtin bi wî re hat kirin.
Piştî çalakiyê rejîm û îşkencekar neçar man paşve gav biavêjin û îşkenceyan bidin rawestandin. Girtiyan hin maf jî bidest xistibûn.
ÎROJ.....
Ji wê demê ve êdî li hember zilm û zordariyê ev çalakî wek mînak hat girtin. Bandora vê çalakiyê li her derê Kurdistan belav bû. Çalakvanên vê berxwedanê mîrasek hiştibûn; di kîjan rewşê de dibe bila bibe, teqez rêyek heye ku mirov pêvajoyê bide rawestandin. Heger di dawiya vê çalakiyê de mirin jî hebe. Wan bi şehadeta xwe dirûşima “Berxwedan Jiyan e” ev yek îsbat kiribûn.
Peyama 14’ê Tîrmehê gihîşt çiyayê Kurdistan. PKKê şerê çekdarî da destpêkirin. Îroj hên jî çirûskên berxwedana wan li her deverê Kurdistan di têkoşîna azadiya Kurdistan de wek ronahiyek e.

## Çiya ji bo Êzidiyan cihê herî bi ewle ye



Welatiyê ji Şengalê Seyîd Miço ku di dema êrîşên çeteyên DAIŞ’ê li ser Şengalê de, bi malbata xwe ve çûn Çiyayê Şengalê anî ziman ku çiya ji bo wan cihê herî bi ewle ye û timî ew ji fermanan parastine.
Gelê Êzidî ku di dîrokê de rastî gelek ferman û komkujiyan hatine, timî ji bo parastina xwe ji fermanan berê xwe dane çiyan. Di dema fermana Tebaxa 2014’ê de çeteyên DAIŞ’ê êrîşê Şengalê kirin, bi hezaran welatî û malbatên Êzidî yên Şengalê berê xwe dan Çiyayê Şengalê û heya niha jî dibin şert û mercên zehmet de dijîn.
Yek ji welatiyên Şengalê Seyîd Miço ku dema fermanê de bi malbata xwe re çûne Çiyayê Şengalê, diyar kir ku çiya timî bûne stargehên wan ên dema fermanan de û wiha got; “Di dema fermanê de diyar bû ku çiya çend ji me re giringe. Di dema bav û kalên me de jî me dîtibû, lê vê carê hemû kesê bi çavên xwe dît ger ku çiya nebin, Êzidî bi qirkirinek çawa re rû bir û dibin.”
Miço da zanîn ku dema rejîma Baas de Êzidî ji çiyan dûrxistin, ev jî weke fermanekê bû ji bo wan û got; “Me di deştê de gelek zehmetî dîtin. Em rastî gelek pirsgirêkan hatin. Ji bo wê jî Êzidî di çiyan de xwe diparêzin. Lê hikûmeta Sedam dixwest Êzidiyan ji çiyan dûrbixwe. Ev ji bo qirkirina Êzidiyan bû.”
Di dawiyê de Seyîd Miço bang li Êzidiyan kir ku xwedî li xak û çiyayên xwe derkevin, ji ber çiya ji bo wan cihên herî bi ewle ne…
*ROJNEWS*



# Dixwazim rizgarkirina Efrînê bibînim

***Dayîka Eyşe ya 105 salî ku niha li gundê Um Hoş yê Şehbayê dimîne da zanîn ku daxwaza wî ya dawî rizgarkirina Efrînê bibîne û vegere Efrînê. Dayî Eyşeyê got, “polîtîkayên ku berê di dema Îngiliz, Fransî û Osmaniyan de li ser Kurdan dihatin kirin îro jî dîsa dewam dikin.”***



Dayika bi navê Eyşe Necar a 105 salî ku bûye şahidê qirkirinên li ser gelê Kurd, anî ziman ku daxwaza wê ya herî dawî ew e ku Efrîn ji dagirkeran rizgar bibe û vegere ser axa xwe.
Dayika Eyşê ya 105 salî ku ji gundê Um Hoş a Şehbayê ye, xwediyê 12 zaroka ye. Dayika Eyşê heta temenê xwe yê 105 salî bûye şahidê gelek hovîtî, tunekirin û qirkirina li ser gelê Kurd ku pêk hatine. Dayika Eyşeyê da zanîn ku ji dîrokê heta niha gelê Kurd bi polîtîkayên tunekirin û qirkirinê rû bi rû mane û timî axa wan hatiye dagirkirin.
Dayika Eyşeyê da zanîn ku ew bûye şahidê dagirkeriya Îngiliz û Fransiyan a li ser axa Kurdistanê û got: “Dema em li dîroka gelê Kurd dinêrin her dem bi êş û kulê derbas bûye. Lê gelê Kurd dîsa jî serî netewandiye. Li dijî dagirkeriya Îngliz, Fransiz, Osmaniyan her dem li ber xwe daye. Ez bûm şahidê dagirkeriya Îngiliz û Fransiyan. Di wê serdemê de jî dîsa sîvîl dihatin qetilkirin û revandin. Wê demê wan jî gelek zilm li gelê Kurd kirin. Berê Osmaniyan gelê Kurd qetil dikirin, niha jî di bin navê Komara Tirkiyê de axa gelê Kurd tê dagirkirin û bi hezaran kes tên qetilkirin.”

### JIN DÎSA DIBIN HEDEF

Dayika Eyşeyê destnîşan kir ku berê jî jin hedef dihatin girtin, niha jî hedef tên girtin û wiha dewam kir: “Ji dîrokê heta niha jin her bûne qurbana polîtîkayên qirkirinê û hedef hatine girtin. Niha jin dîsa hedef tên girtin. Jinê her dem li dijî polîtîkayên qirkirinê li ber xwe dane. Niha jî li ber xwe didin.”

### EZ DIXWAZIM VEGERIM EFRÎNÊ

Dayika Eyşeyê destnîşan kir ku daxwaza wê ya herî dawî ew e ku vegere Efrînê û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Min heta temenê xwe yê 105 salî gelek tişt dîtin, ez gelek tişt jiyam. Tiştê ku heta niha herî bandor li ser min kiriye têkoşîna tevgera azadiya Kurd e û daxwaza min a herî dawî jî ew e ku ez vegerim Efrînê.”…*JINNEWS*

## Dema bêriya gund dikim diçim cem pez



Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) dayîka bi navê Xelfiye Tunç a kû debara mala xwe bi sewalkariyê dike û koçber e zor û zahmetî û jiyanê kir.

LÎ Wargeha Şehîd Rûstem Cudî (Mexmûr) dayîka bi navê Xelfiye Tunç a kû li wargehê dijî, ji bo debara mala xwe karê sewalkariyê dike û bêrîvan e. Xelfiye girêdana xwe ya bi sewalkariyê re wiha vedibêje: “Dema bêriya gundê ku lê ji dayik bûme dikim diçim gel pez. Ji ber ku me li gundê xwe jî sewlkarî dikir û dema diçim hemû bîranînên min tên bîra min.”
Xelfiye Tunç a ku ji bakurê Kurdistanê ye û di salên 1990’î de ji ber zilm û zordestiya dewletê niha li wargeha Penaberan a Rustem Cudî (Mexmûr) penaber e wiha bahsa jiyana xwe dike: “Heskirina min ya ji sewalkarî û bêrîvaniyê ji zarokatiya min tê. Dema ez zarok bûm li Bakur jî malbata min bi sewalkariyê mijûl bû. Ez li gel dayik û bavê xwe diçûm ber sewalan, her tim bi coşeke mezin me dest bi karê xwe yê sewalvaniyê dikir û me pez xwedî dikir. Gundê me yê bi navê Mijin bi xweşikbûna xwe ya xwezayî û avhewaya xwe bi nav û deng bû. Em di sala 1994’an de ji gund koçber bûn, me berê xwe da gelek waran. Lê herî dawî em li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî bi cih bûn. Heta me jiyanek ku mirov bikaribe bijî da avakirin, me gelek zor û zehmetî kişand.”
Xelfiye Tunç di berdewamiya axaftina xwe de kêfxweşiya ku ji karê xwe digire parvekir û got: “Dema ez dest bi karê xwe dikim bi keyifxweşiyek pir mezin, bi karê xwe mijûl dibim, kengê ez tengezar bibim ez bere xwe didim cihê kû ez berivantiyê lê dikim. Her ku diçim gel pez, bîranînên min ên ku min li gund jiyan e tên ber çavên min. Ji bo ku debara mala xwe bikim û zarokên xwe mezin bikim, şîrê ku ez tînim dikim mast, penir, lorik, duhn, hwd. çêdikim. Ez tu carî karê ku dayika min fêrî min kirî ji bîr nakim û her tim xwedî lê derdikevim. Ji ber ku me li gundê xwe hem sewalkarî û hem jî çandinî dikir ev van karan ji malbata xwe hîn bûme.”
Xelfiye Tunç di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî dayik û keçên ciwan kir û wiha got: “Di vê em her tim xwedi li çanda xwe derkevîn. Heta ku ji destê min were, ez e vî karî berdewam bikim.”…
*Hîlal Rizgar -Xurbet Tallî*

## Amadekariyên Kongreya duyemîn a Kongreya Star dewam dikin



Endama Komîteya Amadekar a konferansa Kongreya Star a Helebê Hêvîn Silêman destnîşan kir ku ji bo lidarxistina kongreya duyemîn a Kongreya Star û her wiha ji bo nirxandina rewş, çalakiyên kongreyê û her wiha pêşniyarên pêşxistina xebata kongreyê, amadekariya konferansa xwe ya duyemîn dikin.
Jinên taxa Şêxmeqsûd a Helebê di 15’ê Çile ya 2017’an de konferansa xwe ya yekemîn li dar xistibû.
Piştî sal û nîvekê û ji bo nirxandina xebatên kongreyê, jinên taxê amadekariya konfransa xwe ya duyemîn dikin.
Endama Komîteya Amadekar a konferansê Hêvîn Silêman derbarê sedema lidarxistina konferansê de wiha got: “Ji ber rewşa Efrînê, binpêkirinên dagirkeriya tirk li herêmên Bakurê Sûriyê û Efrînê, ji ber rewşa pêvajoyê, her wiha ji ber hin kêmasiyên ku ji aliyê rêxistînî ve di Kongreya Star rû dan, me hewcedarî bi lidarxistina konferansê dît.”
Hêvîn destnîşan kir ku konferans ji bo birêxistikirin, aktîfkirin û azadkirina hemû jinên Ereb, Kurd, Suryan, Ermen û Tirkmen pêwîst e. Hêvîn da zanîn ku komîteya amadekar ya konferansê hatiye derxistin û wan rêzecivîn ji bo hilbijartina rêveberiyên komînan û xetan li dar xist.
Endama Kongreya Star Hêvîn Silêman bang li hemû jinan kir ku ji bo pêşaroja Sûriyê, di bin sîwana Kongreya Star de xwe bi rêxistin bikin.

## Li dijî tunekirinê serdema têkoşînê ye




Berdevka Meclîsa Jinan a HDP’ê Dîlan Dîrayet Taşdemîr diyar kir ku wan ji bo serdema nû seferberiya rêxistinê dane destpêkirin û got: “Ji bo me serdema nû serdema têkoşînê ye.”
Meclîsa Jinan a Partiya Demokartîk a Gelan HDP’ê di 9’ê tîrmehê de civîna xwe li dar xist û piştî hilbijartinê nirxandinên pêvajoya nû û plansaziya wê kirin. Berdevka Meclîsa Jinan a HDP’ê Dîlan Dîrayet Taşdemîr têkildarî plansaziya nû axivî û diyar kir ku jin di hilbijartinan de rolek girîng lîstine û got: “Keda jinê ya hepvar carek din derket holê. Rêxistina me ya jinan a ku li kolanan û li her deverê xwe dide nîşandan carek din xwe da xuyakirin. Me di civînê de jî nîqaşa li ser pergala faşîst a ku pê re rû bi rû mane nirxand. Ev sê sal e dixwazin siyasetê bê jinan birêve bibin û ev didome. Vê polîtîkayê gelek parlamenterên jin û aktîvîstan girt û saziyên wan girt. Astengiyên pir mezin li pêşiya rêxistinkirina jinan hebûn û ev astengî didomin.”
Taşdemîr anî ziman ku ji bo serdema nû xeta têkoşîndayînê û plansaziya xwe jî saz kirin e û wiha dewam kir: “Li dijî vê desthilatdariya li ser jinê her tiştî ferz dike û rewa dibîne berpirsyariya me mezin e. Ji ber vê pergala faşîst wê têkoşîna me hin bêtir radîkal dewam bike.”
Taşdemîr destnîşan kir ku li dijî pergala “yekzilamî” ku destpê kir wê rêxistinbûna xwe mezintir bikin û got: “Wê pêvajoya pêşiya me bi vê pergala nû re hin bêtir tişt biqewimin. Me jî li dijî van pêkanînên nû yên serdema nû seferberiya rêxistinbûyînê da destpêkirin.”
Taşdemîr da zanîn ku ew wek Meclîsa Jinan a HDP’ê wê komên xweser yên jinan ava bikin û wê 3 mehê pêşiya wan wê ji bo wan bibe pêvajoya pêngava rêxistinbûnê û wê plansaziyên xwe siberojê ji raya giştî re aşkere bikin.
Taşdemîr bal kişand tecrîda ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got: “Yek ji plansaziya jinan ew e ku li dijî tecrîda ser birêz Ocalan xeta têkoşînê bihûnin. Polîtîkaya çewt a li ser jinan tê birêvebirin ji polîtîkaya tecrîdê ne cudatir e. Pêkanîna tecrîdê kûrkirina şer e. Kurkirina şer jî tê wateya rêxistinkirina zilaman.”

### SERDEMA TÊKOŞÎNDAYÎNÊ YE

Taşdemîr da zanîn ku ew ê li her deverê têkoşîna belav bikin û got: “Em ê wek jinên HDP’yî li dijî tarîtiyê li qadan bin. Li dijî hemû tasfiyekirin û pêkanînên li ser jinan em ê ji nû ve piştevaniya jinan xurt bikin. Ji bo me wê serdema pêşiya me serdema têkoşîndayînê ye.”

# Derbasbûna hêzên rêjîmê li Tebqayê rast nîne

**Derbarê gotegotên girêdayî avakirina devereke ewlehiyê ya rêjîma Sûriyê li Tebqayê û wergirtina bendava Firatê de Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê daxuyaniyek da û ew îdia derewand û got, "Tu peyman bi rêjîmê re derbarê bendavê yan mijareke din de pêk nehatine."**

Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê gotegotên ku dibêjin hêzên rêjîma Sûriyê devereke ewlehiyê ji xwe re li Tebqayê ava dike, yan wê bendava Firatê wergire, bi daxuyaniyekê derewand.
Derbarê gotegotên girêdayî avakirina devereke ewlehiyê ya rêjîma Sûriyê li Tebqayê û wergirtina bendava Firatê de Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê daxuyaniyek da û ew îdia derewandin.
Daxuyaniya rêveberiyê wiha ye: "Li ser navê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Herêma Tebqayê, girêdayî gotegot û îdiayên ku hin alî li ser malperên civakî belav dikin ku hêzên rêjîmê derbasî Tebqayê bûne, tu rastiya van gotegotan tune ye.
Karmendên kevn ên bendava Firatê yên girêdayî rêjîmê hê jî li ser karê xwe ne. Ji ber ku bendav berhemeke niştimanî ye û kehrebeyê ji hemû herêmên Bakurê Sûriyeyê re peyda dike. Ji ber vê yekê bendav di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de rastî gelek ziyanan hat. Ji ber kêmderfetan em xebatên karmendên berê yên bendavê û xebatkarên ku ji aliyê Rêveberiya Sivîl ve hatine erkdarkirin, wek pirsgirêk nabînin. Bi taybetî ji ber ku xebatên wan dikevin xizmeta giştî welatiyan. Tu peyman bi rêjîmê re derbarê bendavê yan mijareke din de pêk nehatine.
Girêdayî gotegotên avakirina devereke ewlehiyê li Tebqayê jî tu rastiya vê jî tune ye û ev îdiayên ku li ser malperên civakî ji aliyê hin kesan ve hatine belavkirin, dûrî rastiyê ne. Dubare em diyar dikin ku em ji hemû diyalogên dikevin xizmeta gelê Sûriyeyê re amade ne û bi taybet di aliyê xizmetguzarî û berhemên hevbeş de."

## Me li ber xwe da, em ê li ber xwe bidin



9'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê, 13 roj berê der barê Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven de biryara berdanê dan û îro heman dadgehê bi yek dengî biryara berdewama girtinê dan. Guven bertek nîşanî biryarê da û got: "Ger ku hiqûq ji bo hemû kesan wekhev bûya, îro wê ev yek nebuya."
9'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê ku bi yek dengî derbarê Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven de biryara berdanê dan, heman dadgehê bi yek dengî derbarê Guven de biryara berdewama girtinê da. Dozger derbarê Leyla Guven de ji 25 salan heta 45,5 salan ceza dixwaze. 2'emin rûniştina doza Guven li 9'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin.
Guven, parastin bi kurdî kir û diyar kir ku ji xwe wekî Seroka KCD'ê tê darizandin û wiha got: "Ez niha wekî Parlamentera HDP'ê ya Agirî têm darizandin. Wekîltiya HDP'ê wekî yelekê ji agir e. Heta niha me çawa di vê rêyê de li ber xwe da, em ê ji niha û şûnde jî di vê rêyê de li ber xwe bidin. Vê dadgehê derbarê min de biryara berdanê da. Piştî min alavên xwe yên girtîgehê kom kir, ez bernedam. Ez bi SEGBÎS'ê derxistim 10'emîn dadgeha Cezayên Giran a Amedê û diyar kirin ku derbarê te de biryara girtinê heye. Ji xwe ez hê jî girtî bûm û li girtîgehê bûm. Ger ku hiqûq ji bo her kesî wek hev pêk hatibûya ez dê ne li vir bûma û wê ev tişt çênebuya."
Guven, anî ziman ku dadgerê derbarê wê de biryara tahliyê da niha ne li salonê ye û wiha berdewam kir: "Ez tahliya xwe naxwazim. Ez tenê wîcdan dixwazim. Ez dixwazim tenê hûn li gorî hiqûqê tev bigerin. Ji ber em hiqûqê dixwazin. Wezîr ji me nifrînê dike. Lê em dixwazin bila biryar wîcdanan birîn nekin."
Parêzera Guven Reyhan Yalçindag Baydemir xwest biryara li dijî hiqûqê bi dawî bibe û wiha got: "Piştî 24'ê Hezîranê Guven' hatiye hilbijartin û li gorî xala 83'emin a Qanûna Bingehîn destnedayîna wê heye. Yalçindag, xwest Guven bê berdan û darizandina wê bê rawestandin.
Pişt re dozger xwest ku girtina Guven dewam bike û kêmasiyên di dosyeyê de temam bibin. Guven li dijî mutalayê mafê axaftinê girt û bertek nîşanî sûcên daivêjin ser wê da. Guven got: "Tişta îro hûn dibêjin sûc, ji bo me nû sûc e. Me tenê mafê xwe bikaranî. Wê dozger jî rojekê hewceyî vê yekê bibe."
Piştî parastinan heyeta dadgehê biryara xwe aşkere kir û bi boneya kêmasiyên di dosyeya dozê de bên temamkirin rûniştin taloqî 7'ê mijdarê kir.

## Çerxa qirêj ya Erdogan

Bi rejîma Erdogan re rêxistineke nû ya bazirganî ava bû. Pereyên qirêjî cihokên nû ji xwe re dîtin. Ev çerxa ku li dora Erdogan ava dibe patronên nû çêkir. Hemû ji pergala nû re hatin hazirkirin.
Ji berevaniyê bigirin ta bi enerjiye, perwerdehî, tenduristî, tekstîl û heta bi medyayê, li hemû sektoran torên Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan bû serdest. Hin jê dilsoziya xwe ya bi Erdogan re bi navê 'eşq'ê vegotin, hin jê tam bi rengekî rajêrbûnê, hin jê ji bo efendiyê xwe yê nû ketine pêşbirkê. AKP ya ku 2002'yan hatî ser kar polîs, leşker, medya, daraz bi dest xist, bi rengekî paralel derdora kar jî bi xwe ve girêda. Qedrotî ji her qadê ve hate avakirin.
Berat Albayrak bû mirovê herî li pêş ê siyasî yê Erdogan. Bêguman ne tenê ye. 'Sultan' bi zirxekî bazirganî dora xwe pêçaye. Weke polîs û leşkeran ev jî hem li dijî muxalefetê hem li dijî karker û kedkaran bi rengê amûra zext û tundiyê derdikeve pêş. Gendelî, pereyên gemarî, mêtingerî û jê zêdetir di nav vê çerxê de dizîvire. Amûrên sereke yên zorê yên rejîmê, ji hêla toreke berfireh a şîrketan ve tê rêvebrini. Hemû sûc diafirînin, dibine hevkarê sûc. Em bi pergaleke wiha ya aborî ya milîtarîst re hevrû ne ku berevaniya li rejîma dikta û geşkirina wê daye ber xwe.



## AKP'ê xwest, DAÎŞ'ê pêk anî



AvEG-Konê, qurbaniyên Pirsûsê bi bîr anî û got, "AKP'ê zemîn amade kir, DAÎŞ'ê jî komkujî pêk anî."
Konfederasyona Penaberên Bindest ên Ewropayê (AvEG-Kon), ji bo 33 ciwanên li Pirsûsê hatî kuştin daxuyaniyek weşand.
Daxuyanî wiha ye: "20'ê Tîrmeha 2015'an li ser banga SGDF'ê, bi sedan ciwanên ji bo tevli xebatên ji nû ve avakirina Kobanê bibin li Pirsûsê, li ber Navenda Çanda Amara civiyabûn. Di dema ku daxuyaniya çapemeniyê dihat dayîn de, çeteyên piştgirî ji dewletê digirtin, li hemberî wan komkujiyek pê anî. Di vê rêwitiya xeyalan de 33 ciwanan jiyana xwe ji dest dan, ji sedî wêdetir jî birîndar bûn."

### AKP'Ê XWEST TOLÊ HILÎNE

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Ji bo ji banga Rojava re bibin bersiv, bi dengê xwe can bidin jiyana nû, derketin ser rê. Xwestin li Kobanê ya ku ji DAÎŞ'ê hatî rizgarkirin, pirtûkxane, parkên zarokan çêbikin, daran biçînin, li wê derê di lêkirina avahiyan de bixebitin, li nexweşxaneyan xizmet bikin. Lê hatin kuştin, lewra dîktatoriya Erdogan/AKP a ku xeyalên wan ên xistina Kobanê pêk nehatî, xwest bi DAÎŞ'ê re ji kesên ku xwedî li Kobanê derdikevin, ji sosyalîstan, şoreşgeran tolê hilîne.
Dîktatoriya faşîst a Erdogan/AKP'ê, 7'ê Hezîrana 2015'an têk çû. Lewre serkeftina HDP'ê hezim nekir û dest bi konsepteke nû ya şer a qirêj kir. Piştî komkujiya Pirsûsê li Enqerê, Îstanbûl-Sûltanahmetê, li Balafirgeha Îstanbûlê, li Cizîr, Sûr, Silopî, Gever, Xarpêt û gelek cihên dîtir komkujî pêk anîn, bajar bi erdê re kirin yek, mirov di jêrzemînan de şewitandin."
AvEG-Konê, wiha dawî li daxuyaniya xwe anî: "Bi hilbijartinên 24'ê Hezîrana 2018'an re zemîna dîktatoriya yek-zilamî tê têkûzkirin. Hilbijartinên ku bi her cure hîle, zext û bazariyên kirêt hatî qezençkirin rewa nîn e. Lewma ji bo hemû kes û derdoran pêvajoyeke xurtir, bi biryartir û ji xwebawer a têkoşîn destpê kiriye. Ji bo wê, di vê heyamê de ji bo hesabpirsîna Pirsûsê derketina kolanan girîng û watedar e. "



# Li MÎT'ê sê mehan êşkence lê hat kirin

**Ziynet Saglam dema ku êrîşên dagirker ên ser Efrîn Cindirêsê de hat girtin, diyar kir ku li navenda MÎT'ê êşkence lê hatiye kirin. Saglam got, "10'ê Adara 2018'an li gundekî Cinderesê mala ku lê bûm hat bombekirin û di malê de bav û keç yên xwediyê malê mirin ez jî birîndar ketim destên komên çete."**



Ziynet Saglam ku dema êrîşên dagirker ên ser Efrînê hatî girtin, qala tiştên bi serê wê ve hatin kir. Saglam got, li navendên MÎT'ê êşkence lê hatiye kirin.
Ziynet Saglam ku di dema êrîşên dagirker ên ser Efrînê de hatibû girtin û paşê bi "endamtiya rêxistinê" hate tawanbarkirin û girtin. Saglam, diyar kir ku ew birine Ezaz û Dîlokê û li navendên MÎT'ê êşkence lê kirine.
Ziynet Saglam ku bi tawanbariya "endamtiya rêxistinê" hat girtin û niha di Girtîgeha Jinan ya Tarsûsê di hucreya yekkesî de ye, ji ber ku îdareya girtîgehê daxwaza wê ya çûyîna cem hevalên wê yên ji heman dosyeyê hatine girtin qebûl nekir, 11 roj in di greva birçîbûnê de ye. Saglam, diyar kir heta ku daxwaza wê neyê qebûlkirinê wê çalakiya wê dewam bike. Saglam bi rêya parêzerên xwe tiştên ku li Efrînê û Tirkiyeyê hatine serê wê û dîtiye bi raya giştî re par ve kir.
Saglam, diyar kir ku di dema operasyona li hemberî Efrînê de ew li Cinderesê bûye, lê belê endamên MÎT'a Tirkiyeyê û endamên OSO'yê bi îdiaya "sûcê şer" ew tawanbar kirine û tiştên di vî warî de vegot.

### HEMÛ CÎHAN HEVPARÊ VÎ SÛCÎ YE

Saglam, diyar kir di 10'ê Adara 2018'an de li gundekî Cinderesê mala ku lê bûye hatiye bombekirin û di malê de bav û keç ku xwediyê malê bûn mirine û ew jî birîndar bûye. Saglam, diyar kir heta demekê di nav kavilên malê de maye.
Saglam, anî ziman ku dema ji nav kavilên xanî derketiya endamên OSO û leşkeran ew zevt kiriye û ev kes wê şilfî tazî kirine, kincên YPJ'ê lê kirine, ew taciz kirine û gef lê xwarine. Saglam got: "Bi vî awayî wêneyê min kişandin. Leşkerên Tirk ji bo xweş baş nîşan bidin û ser komkujiya ku kirin bigirin xwarinên cur bi cur danîn ser maseyan bi zorê qedehe xistin destên min û wêneyê min kişandin. Leşkerên ku di dest wan de kêr û çek hebûn digotin 'tekbîr' û dikişandin. Paşê min xistin odeyekê, dest û lingên min û çavên min girêdan. Êvarî jî min birin odeyekê, bi cop, xirtûm û qabloyan ez êşkence kirim."

### EW JI EFRÎNÊ BIRIN EZZAZÊ

Saglam, anî ziman, ji ber bi awayekî dijwar îşkence kirine tim ji ser hişê xwe diçû û got: "Ev kes bi kêrên di dest xwe tim hewl didan ku qirika min jê bikin. Her ku dihatim ser hişê xwe digotin 'em ê qirika te jê bikin.' Paşê ji wir ez birim serşokê. Li wir kincên min ên qetiyayî derxistin û xwestin bêceme li xwe bikim. Paşê min birin ber mizgeftekê. Gotin tekbîr û xwestin qirika min jê bikin. Ji ber ku bi rojan min av venexwaribû, min av xwest. Kêrê li ser qirika min dibirin û danîn. Piştî demekê hin kesan gazî wan kir û ez xistin wesayîtekê û ji Efrînê birin Ezazê."

### ENDAMÊN MÎTÊ LÊPIRSÎNA WÊ KIRIN

Saglam, anî ziman ku demaew birine di rê de tim ew êşkence kirine û li Ezazê ew xistine hucreyeke ku 5 jinên Efrînî yên bi awayekî dijwar hatine êşkencekirin jî lê bûn. Saglam, diyar kir ku li vir kesekî ku gotiye ew ji MÎT'ê ye ew daye ber lêprisînê û bi fermana wî hatiye êşkencekirin û gefa ku wê tecawizî wê bikin lê xwarine. Saglam, diyar kir ku li van navendên ku ku di bin kontrola elemanên MÎT'ê de bûn, ew nîşanî kesên din didan ku ew kes dihatin êşkencekirin û dixwestin ev kes wê teşhîs bikin.

### ÇEWAL XISTIN SERÊ WÊ Û EW ANÎN DÎLOKÊ

Saglam, bilêv kir ku li vir piştî mehekê û her roj êşkencekirin, dest û lingên wê hatine girêdan û çewalek xistine serê wê û ew birine Dîlokê. Saglam, da zanîn ku dema ew anîne Dîlokê demeke dirêj tazî hatiye sekinandin û paşê elemanên MÎT'ê kincekî reş lê kirine û ew birine odeyeke bi sîneger ku li her derê wê qabloyên ceryanê hebûne.
Saglam ku got "Ji ber ku her derê min birîn bûn û bin lingên min hatibûn teqandin, dema ceryan didan canê min min fêm dikir ku goştê min diqele" destnîşan kir ku li vir wê xistine asqiya Filîstînê, qefesê û hatiye êşkencekirin.
Saglam, bilêv kir ku li vir jî 20 rojan hatiye êşkencekirin û wê dîsa birine Ezazê. Saglam, da zanîn ku vê carê li vir li qawîşeke 5 kesî 38 jin hebûne û ev jin hemû hatibûn êşkencekirin, tacizkirin û tecawizkirin. Saglam diyar kir ku ji ber êşkence û zilmê derûniya wê xirab bûye û got: "Di hucreyê de her saniye êşkence hebû."


### GEF XWARIN KU JI KESÎ RE NEBÊJIM

Saglam, da zanîn ku tam 2 meh û 20 roja hatiye êşkencekirin û ji ber vê pir qirêjî bûye û loma pora xwe jê kiriye. Saglam, got, rojê carekê lê pir hindik xwarin didan wan. Saglam, diyar kir ku piştî 3 mehan şûnde ew birine Kilîsê û şandine dozgeriyê û li wir xwestine dijî PKK'ê de dîmenan bigirin û got: "Li dozgeriyê çewisandineke derûniyî hebû. Kamera anîn. Ji min re gotin bêje 'PKK'ê ez êşkence kirime.' Min qebûl nekir. MÎT'ê ku li Ezazê ez êşkence kirim 'tiştên me li te kiriye, tiştên ku te dîtine divê ji kesî re nebêjî. Eger bibêjî em ê te bibînin û bikujin.' Paşê ez şandim dadgehê û hatim girtin. 23 rojan di Girtîgeha Kilîsê de mam. Paşê min sirgûnî Girtîgeha Tarsûsê kirin."
Saglam, da zanîn ku dema ew anîne Girtîgeha Jina ya Tarsûsê, li têketina girtîgehê lêgerîna tazî lê ferz kirine û ji ber birînên li ser canê wê ew birine nexweşxaneyê û rapor hatiye amadekirin. Saglam, got bi hinceta "birînên li ser canê te baş nebûn" wê naxin hucreya kesên ku ji heman dosyeyê hatine girtin.

## Li başûrê Sûriyê şerekî giran diqewime



Li başûrê Sûriyê li bejahî şerekî dijwar diqewime, ji hewayê jî bombebarana Rûsyayê didome.
Şer li cihekî herêma Derayê ku çeteyên DAÎŞ'ê lê ne, diqewime.
Piştî ku rejîma Sûriyeyê û komên din ên çekdar roja Înê li hev kirin, herêmên din bêdeng in. Di çarçoveya lihevkirinê de komên çekdar kontrola herêmê radestî rejîmê kiribûn.
Koma Xalîd bîn Welîd ku komeke ser bi çeteyên DAÎŞ'ê ve ye, di nava lihevkirinê de nehate bicihkirin. Ev koma çete li girên Golan a ji aliyê Urdun û Îsraîlê ve hatiye dagirkirin û li nêzî sînor bi cih bûye.
Li bajarokê Hetê yê ser bi Yermûkê, di navbera çeteyên DAÎŞ'ê û komên din ên çekdar de şer qewimî. Şerê navbera hêzên rejîmê û DAÎŞ'ê jî bi giranî li Siwedayê diqewime.
Li gorî Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, çeteyên ser bi DAÎŞ'ê li bajarokê Hetê bi pêş ve çûne. Hêzên hewayî yên Rûs jî bombeyan li bejahiya Yarmûkê û bajarokê Sehîm El Colanê dibarînin ku ji aliyê koma xalîd bîn Welîd ve hatine dagirkirin.
Li gorî saziyê, heta niha nêzî 30 hezar sivîl li bejahiya Yarmûkê di nava şer de mane. Tê gotin ku çete sivîlan weke mertalên zindî bi kar tînin.
Şer li cihekî bi 4 kîlometreyan dûrî sînorê Urdunê û bi 10 kîlometreyan li ser xeta sînor diqewime. Çeteyên DAÎŞ'ê topan diavêjin bajarokê Zayzûnê. Li vî bajarokî roja Sêşemê li dijî hêzên rejîmê û komên din ên çekdar êrîşeke xwekujî hatibû kirin û 14 kes miribûn.Rejîma Sûriyê operasyonên xwe yên li dijî Derayê 19'ê Hezîranê zêde kiribû. Ji ber şer, li gorî Neteweyên Yekbûyî 200 hezar kesî xwe li sînorê Sûriye û Îsraîlê girtin. Rejîma Sûriyeyê bi piştgiriya Rûsya û Îranê 60 ji sedî yê Sûriyeyê kontrol kiriye.



## Di neynika dîrokê de Nêçîrvan Barzanî

Mihemed ŞAHÎN

Kurdê ku bi xwe re, bi gelê xwe re, bi welatê xwe re, bi doza xwe re, îxanetê neke nabe şêrînê ber dilê neyar û di qesran de nayê pêşwazî kirin. Îxanetkarên gelê xwe şêrînên ber dilê neyar in.
Sedsalên 19 û 20'emîn ên ku di cîhanê de weke sadsalên azadiya netewan tên pênasekirin bi êş û azara civaka Kurd ve dagirtîne. Di van sedsalan de civaka ku herî zêde ji bo azadiya xwe serîhildaye û herî zêde berdêlên giran daye û azadiya xwe bidest nexistiye yek jî civaka Kurd e. Yekane sedema neserkeftina civaka Kurd hişmendiya kevneperest a feodalî ya mîr, beg, şêx û axayên Kurd a parçebûyî ye.
Ji bo wan a esas ne Kurdistan û ne netewa Kurd bû, a esas Mîrekî, Begîtî, Axatî û deshilatdariya wan bû. Hişmendiya parçebûyî ji bo îxanet û hevkariyê bingeheke xurt pêşkeşî serdestan dikir. Dîroka Kurdistanê yê 200 salên dawîn bi encamên gelek dilsoj ên vê hişmendiya parçebûyî ve dagirtiye. Bê tifaqî, îxanet û têkçûn weke qedereke nebixêr li ser kurdan hatibû ferzkirin.
Dema ku mîrekî an begekî serî hildaye dagirkeran pişta mîr û begên din mizdane, xwe biwan şêrîn kirine û ew kişandine xeta îxanetê. Bê guman piştî têkçûna serhildanê di serîde Kurdê îxanetkar hatiye tasfiyekirin.
Serok û rêbrên Kurd neçarin bi vê zanebûnê têdikoşîn û bi vê zanebûnê helwesta xwe ya li dijber neyar diyar bikin. Neyarê bavan nabin dostê lawan, heke îro ji têkçûna birayê xwe re bêdeng bimîne dê sibê dor were wî.
Di 1946'de dadgeha Îranê ji Qazî Mihmed re dibêje te kesên biyanî (ji başûr Mele Mistefa Barzanî û hwd., ji bakur Kadrî û Ekrem Cemîlpaşa û hwd.) vexwendine axa Îranê û îxanet li dewleta Îranê kiriye. Qazî Mihemed dibêje "Ev erdnîgarî ne yê Îranê û ne yê bavê min e, Kurdistane û yê hemû Kurda ye. Ew kes Kurdistanî ne û ev der welatê wan û malê wan e, pêdivî bi vexwendina min tune ye."
Li Başûr dema ku muxabîrê AA'yê dixwaze ji PKK're bibêje "terorist" ji avakarên YNK'ê Adil Mûrad hevokê di qirika wî de dihêle û dibêje "jibîr neke tu li Kurdistanê yî, tu li Kurdistanê nekarî ji yek rêxistina Kurdî re bibêjî terorîst, terorîst dewleta te bixwe ye".
Dema ku wezîrê tirk Ferîdûn Sînîrlîoğlu di hevdîtina xwe ya Hewlêrê de dixwaze ji PKK'ê re bibêje "terorîst". Wekîlê YNK'ê yê wê demê Rêzan Şêx Dilêr peyvê di qirika wî de dihêle û dibêje "Hûn li Kurdistanê nekarin ji rêxistineke Kurd re bibêjin terorîst, hûn nekarin wê bidin, PKK jî partiyeke Kurdistaniyê û ji bo azadiya Kurdistanê têdikoşe"
Li gel dîroka dilsoj û li gel van her sê helwestên bi rûmet û payebilind gotinên Nêçîrvan Barzanî yên ku ji bo xwe li ber dilê dagirker şêrîn bike Kurdên birayên xwe li Kurdistanê dagirker nîşan didin weke xencereke zengarî di nava dilê civaka Kurd de çikiyan e.
Nêçîrvan Barzanî xwe li ber dilê Erdogan şêrîn kir û ji bo xelatkirinê wî vexwendin Enqerê. Lê li Enqerê tu kesî pax pê nekir. Xeynî çapemeniya PDK'ê tu kesî qala hebûna wî ya li Enqerê nekir. Heqîqeteke dîrokiye; Kurdê ku nirxên civaka xwe neparêze di bêrûmetiyê de diç e.
Di pêvajoya hemû serhildanan de Kurdên şêrînê ber dilê neyar her tim hebûn. Nêçîrvan Barzanî bila li aqûbeta wan û li pênaseya wan binêhire û biryara xwe bide.
Şêrînê ber dilê neyar dûrketiyê dilê Kurd û Kurdistanê ye.